

HEJMAR
19

pîne

%100
KURDÎ

KOVARA QERFÎ û WÊJEYÎ


kovara qerfî û wêjeyî ya nîv mehî 1-15 ağustos (glawêj) 2000 Sayı: 19

500.000 TL

OPERASYONÊN LI SER GIRTIGEHAN HELWESTA DEWLETÊ DIYAR DIKE!..

Dewletê di du operasyonên dawîn de dozer bi kar anî. Di van operasyonên ku gelek girtî birîndar bûne, piyê girtyekî jî hatiye jêkirin.

WEYLÂ!
TİPA HUCRE
EV E QEY
?



Rehetîname û Rehetîfiroş

Germê îmana we çikand û hêjî diçikîne. Hûn li çareya serê xwe digerin, lê peyda nakin. Bi Xwedê, qet serê xwe pê re neêşînin û belesebep neçin ser doktoran, pereyên xwe xerc nekin! Va ye Psikolog Dr. Sosratîn Facia ji Pîneyê re çarenameyek şandiye; ew dermanê derdê ser derdan e. Biaqiliyê nekin, bixwînin. Piştî we xwend, wê bayekî hênik rabe, hûnê herin 'zozanê nîgaşî (Sanal). Fermo kekacan!

1) Rojnameya Yenî Gundemê bistînin û xaçepirsa wê tomar bikin (Silav û humet hevalê Fatîh Urek û xwişkecan Seda Sayan! Almayanı oyanm).

2) Ji platform û civînan xwe biparêzin. Dema we navê wan bihîst fir bidin an jî bikevin qulika mişkan...

3) Rûpelên aboriyê yên rojnameyan nexwînin, lê bi neyar û dijminê xwe bidin xwendin!... Hema ji kuştinê xedartir el!...

4) Ji filimên Medya TV'yê 'Rê û Rê' birevin; bi taybetî jî ji filimên Ûrisan. (Ji kerema xwe re ji Medya TV'yê re naftalînê an jî dermanê mişkan bişîn!...)

5) Qunciknîsan nexwînin, an na hûnê gêj û sewsî bibin: Kuro îca kî rast dibêje?

6) Beriya berîn û rastiya rastîn 'Surecî degerlendîrmîş' nekin, nexwe hûnê ji ber germê biseqitîn!...

7) Ji xwe re herin kaseta 'Medya Ensemble' an jî Kamkarê bistînin. Bi tena serî, xwe dirêj bikin û lê guhdarî bikin! Nebêjin ev kî ne, herin lê biggerin! Ji we pê ve hemû dinya nas dikel...

8) Nîvîsan Pîneyê nexwînin! (Kovara me li diyaran, rehmet li dê û bavê xwendevanan, ji xeynî nîvîkar û Beko Ewanêni li ber dîwaran!...)

9) Dikira min ji bîr bikira, berî her tiştî li Ecewît guhdarî nekin, an na hûnê bibin mîrkuj!...

10) Li rewşa kurdan, bi taybetî jî têkiliya partiyê kurdan nefikirin!...

Gunêh min bi we tê!... Nekin vê şâsiyê!...

11) Dema hûn cûn saziyên kurdan qala zimanê kurdi nekin û bi vê hêviyê neçin, ji ber ku wê kes li dora we nemînel... (Yalnızım dostlanm yalnızım simdi!...)

12) Heya dawiyê li 'Bêhna Şevê' guhdarî nekin (Yabo ka çeka min, yadê ka destmala min!...)

13) Biçin behrê, lê zêde li der û dora xwe nenihêrin, an na wê kes bi we nikaribe. (Kuro ka wê berçavkê, hinekî ez lê binihêrim! Ez kûçikê ber deriyê tel!)


14) Neçin ser kaniyê, bibexşînin, saziyê. Wê kes li siya we nenihêre û hûnê tu qız û xortan nebînin. (Min tu dîtibû li ser saziyê! Çav şkînand bi naz û endaziyê! Keçê neke vê naziyê! Ay lê ay lê sazî wêran!...)

15) Çavê mino, me dermanê beq ji bîr dikir: Tim û tim li Mahmûd Biksî guhdarî bikin, qet jê nemînin! Nexwe hûnê sax û rehet nebin!...



DIZO

BUREGAN



MIJARA BERGA PAŞIYÊ



Artêşa Tirkî Li Kibrisê Jî Rehet Nasekin...



Wezareta dadê diyar kir ku dosyayê kuştarên wan nediyar di lehiyên avê de wenda bûne. 741 dosyayê kuştarên wan nediyar li benda kifskirinê ne.



MHP di Wezareta Tendurustiyê û zanîgehan de qadroyen xwe bi cî dike



Girtiyekî diyar kir ku gava di bin çav de bû, parêzgerê polêsên şkence kirine Îlhamî Yelekçî, ji bo ku şkenceyê li wî bikin, ferman daye polêsan



Di êrîşa hovane ya li ser girtîgeha Bûrdûrê de, tecawizî jinan kirin. Piyê girtiyekî jêkirin. Pi avêtin ser sergo. Paşê pi di devê kûcîkekî de hat dîtin.

Tegocu?

Zimanake bi navê kurdî tuneye
Parlementerê MHP'yi yê Stenbolê
Bozkurt Yaşar Ozturk



Li Girtîgeha Mêrdînê Kurdî Li Girtiyen
Ku Bi Tirkî Nizanin, Hate Qedexekirrin



TA LI WE BIKEVE

Li NÇM'ê Teatra Jiyana Nû dîsa provayeke bitemaşevan li me qewimand! Bila di navbera me de bimîne, lîstikvaniya wan pir baş bû, tam artîst bûn... Amatorî paş hiştine, êdî bûne profesyonel, mirov ji wan ditirse...

Lîstik ji ber ku sembolîk bû û ez jî ji sembolîzmê fêm nakim, min jê fêm nekir, lê dizanim (nexér nizanim, texmîn û bawer dikim) ku tiştekî pir girîng e. Ez serfiraziyê ji wan re dixwazim. Hûn jî bixwazin.

Lê mirov ji wan ditirse, ji ber ku ji xwe re kirine adet, piştî lîstika xwe dilîzin, derî li temâşevanan digirin û çongê datînin serzikên wan û dibêjin:

-ji kerema xwe rexneyan li me bikin (ji we bê û hûn mîr bin, hûn dikarin rexneyen neyînî jî bikin!). Lîstika me binirxînin! Wê rexneyen we rê li ber me veke...

Mirov bi xwe de birî jî dev jê bermadin. Pêwîst e ku hûn rexneyan (pesnê wan bidin) bikin.


Lê vê carê bivir li kevir xistin!..

Rexnegirekî têra xwe ronakbîr ew peri-tandin, tola me û we bi zêdeyî ji wan hilda... Bi terzeke zaniyarî û gundiyarî ew û lîstika wan dahûrand û dahûrand:

-ji bo ez rê li ber we bixim, ez dixwazim rexneyen xwe bikim. Berî her tiştî, lîstik bi vî awayî nayê nivîsîn (pişt re werin ezê we hîn bikim). We carina got Cûdî heye û carina jî got Cûdî tuneye. Ev nakokiyekê pir mezin e. Ez dikarim li ser hebûna Cûdî sond jî bixwim... Hûn çîma ji bo ku biçin Cûdî keştiyê çê dikin, ji bo çûyîna Cûdî ji we re hesp lazim e. Lîstikvanan rista xwe baş nedî-anîn cî (we bigota minê ji bo we bikira Xwedê ji we razî). Tew hevala Yıldız, ew ci sivikahî bûl.. Dema pere dixwest, (yanî ez nizanim ku çawa bêjîm, naxwazim vê peyvê bi kar bîhim lê ez mecbûr im) weke qahpikan dikir. Heval, min ev yek yaqıştırmış te nekir!..

Rexnegirê me hîn nû li rexnêyên xwe sor bûbû, komplot li serê wî gerandin, pê kenîyan, nehiştin gotina xwe biqedîne...

Xwedê nehêle...



copyright ên ji ber bigirin xwe dê bi
Şirin Gayê xwînê ji qûna wan bikişne

Me berpirsê ranekirina

OHAL'ê qefalt

Şaredarên kurd nahêlin ku OHAL rabe. Belê xwendevanê hêja we şas fêm nekir, me tiştekî faş got. Lî em bi çavkaniyêن xwe yên nediyar û bê cih û war piştrast in. Li gorî agahiyêن ku ji wê kaniyê wekî lehiya Ferêt herikîne, ev du car in ku şaredarên kurd ango serokên belediyeyan nahêlin ku dawî li OHAL'ê were; zilamên telaqres û tilyakges, bi dilê geş û simbêlên tewş ber bi welatê xwe bi rê bikevin, ji derdê kurdan rizgar bibin.

Her çiqas me gotibe çavkaniyênediyar jî, emê çavkaniyekê diyar bikin. Ew çavkanî jî wezirê dewletê yê heyamekê Salih Yıldırım e. Vî camêrî da zanîn ku heke şaredarên kurd xwe nedabûna girtin, dewletê dil hebû ku OHAL'ê rake û her derê bike BÜHAL, lê camêran bi darê zorê xwe dane girtin, lewre jî dewletê OHAL ranekiriye. Xuyaye ku mele Selîm di doza xwe de bi ser neketiye, lewre tevî ku wî xwe da girtin jî li Sêrtê dawî li OHAL'ê hat, ew bajarê tokap û checkupê kete nav sînorê BÜHAL'ê.

Tiştekî ku gotinê Yıldırım diselmînin jî, pêşpîvazbiryara MGK'ê ya bo rakirina OHAL'ê li bajarê Wanê ye. Ji ber ku şaredarê vî bajarî xwe nedabû girtin, dewletê biryar hilda û çavê OHAL'ê kil da, berê wê da tinga dîrokê, ew bû gotina çîrokê.

Li gorî agahiyen di warê ranekirina OHAL'ê de xwediyê helwesta herî tûj şaredarê Amedê Ferîdûn Çelîk e. Lewre gira Çelîk li ser kovara Pîneyê gelek e, naxwaze ku OHAL rabe û Pîne bikeve Amedê. Her wiha birêz Çelîk bi vê yekê jî namîne, berê xwe dide kovara me ya qedirbilind û dilberz Kermêşê jî. Li gorî gotina gotindaran Çelîk xebatkarêne me 'ayartmîş' dike û ci kesê ku li nûnergeha Kermêşê dest bi xebatê dike, dixe karê şaredariyê. Birêz Çelîk bi vê jî namîne, lê dixebeitê ku dozê li kovara me veke. Lî waliyê OHAL'ê doza wî qebûl etmîş naake, lewre êdî ew jî naxwaze çar mehîn din germa Amedê bikişîne. Ew dixwaze biçe ber Behra Reş, horon tepmîş bike. Li gorî agahiyen, brêz Çelîk û Walî wiha avêtine ber hev:

Walî:

Nabe kekê Ferîdûn nabe
Divê rojek berî rojê rewşa awarte rabe
Divê dilê me jî hinekî şâ be.
Ha hîm...

Beriya Dîjle bi kelek e
Derdê dilê'm gelek e (wekî mesala ornegin)
Were tu vê bêbextiyê li me neke
Vê doza giran li Kermêşa reben veneke.

Şaredar:

Nabe walî beg nabe
Ew qas bêbextî dê çâ be
Kes nikare ji bin vê buxtana Kermêşê rabe
Wele ezê bi serê te kim
Tu qebûl dikî, bike
Ger tu nekî ezê vê dozê li DMME'yê (AİHM) vekim.

Walî:

Wele neke, bile neke
Karê ku tu dikî ne tu çek e
Bela xwe ji Kermêşa reben veke
Ew kovar li vê herêmê tek e

Şaredar:

Ha li wî alî, ha li vî alî
Wisa neke birêz walî
Tu raneke qet wî halî
Qene, bila Kermêş jî neyê vî alî (...)
Ew hevîr hê wê alê hilîne, lê mixabin cihê me tune.

KEREM KE!

ERTÜG SONMEZ



LOZIN



Haydar IŞIK

ZİNDİ

Heştere awê bî, zu (yev) mordem Köln ra MEDYA TV telefon kerd û perskerd. "Nêro bira bira o çiko, sima derde ma kerd ra".

Moderator Qemer Söylemez, vat: Bira qusurde niyamede, ala qeseybike, ma ci derde ko kerde ra?" Nêro bira Qemer zindî çiko? "Kirmançkî de zindî çino".

Ez bawerim na mordemo ke telefon keno û vano, zindi kirmançkî niyo, eve xo însan niyo. Nika qeseykerdene dey mi gosdê, hen rind kirmançkî nêzoneno. Wajîme kirmançkî baş qeseykeno.

Însan ke rind qeseykerd, iddia bikeru, ez teferuate zon tam zonen, rast niya. A zu, aye bîne kî, na mîrî kot şî dibistan? Kot zone kirmançkî misa ûbî profesore zon?

Qese tirku esto, vane: "Cahal baxçasında pox biter!" Ez bawerim na mordemo ke zindî zone kirmançkî niyo, vat, çe deyde, qefçiliye bena pir. Nika hem cahilo, hem ji vano ez rind zon. Îste nîyanen zaf tehlîkeliye. Dismen nîyanura zaf haskeno.

Ez nîvîseno xo de nûşnen ke kirmançkî zarave zone kurdan a. Zu mordem mire E-mail rûsneno ûmira haqaret keno, ez çira niya nûşnen..

Vatena mordema nîyanen zazakî, zone serbixweyo û zone uluse zazauno. Dersîm de vane: Heq şero olî re qeseybikero. Nika wazene me nifaq horte millete makere. Nêro zazay kurmanc welatê xo azadkere dima zazay, zazakî, kurmanc kurmançkî û tirk tirkî qeseybikere. Yanî her zarave û her düşünce gereke serbest bivo.


Mi zindî vat, amera mi vîr. MED TV'de program zindî bî û coka ekran de zindî nûşnayvî. Hevale re girs telefon kerd: "Kızım zindi aferim sana, sen bi işi iyi yapıyorsun" vat. Fiqare asimîle bîyo, nêzoneno ke zindî name moderatör niyo. Ez zaf huyio

Cografya ma de her ci asto, qorîcî, îtîrafçî, xayîn û cahîl. Koke pörüne de cahîlen esto. Ez bawerim birêz serok zaf emek da û xeyle rexistene ma kerd ra. Kare bîn kare ronakbîrunu. Hen bikerîme kukes quesenu niyan reyna mewazu.

E-mail: Haydar-İşik@gmx.

Xezen Berkdayî

Mwâs SER



ELETIEWS

Sefer SELVI



MEMED DREWŞ

DIMILIYO WAYIRÊ TORPHIL O

E-mail: mehmet@welat.com

Eke hetanî vizêr jewerî vatayê karê kumançan dimili (zaza) yê kenê, kesî baw (emel) nêkerdê. Feqet nika hinî kes nêşeno tez pûc vejo. Nezdiyê çehar seran min nameya A. Welat de (ebi zora Samî Berbangdimili nûstê. Tim embazan vatê tiyê dim nûsenê, feqet keso niwisanê to nêwanen. Tiyê bi xo nûsenê û bi xo wenanê. Her çiqas min vatê vataşa şima rast niya, nûstoxê dim tayn ê, wendoxî zaf ê û ê kurmancî jî nûstox ci zaf ê feqet wendoxê ci tayn ê û lazim o şima quncik bidê min jî tim quncikê dêş (dîwarê) rojnamî mûsnayê min. Coka mi nêşayê kurmancan îkna bikirî.

Feqet bêrê bewnê peynî de vatena mi rast vejiyê û kurmancan teza min qebûl ker. Çike Gerînendeyê A. Welat Samî Tanî verê c mengan (aşman) min ra vat keso niwisan dimili nêwaneno (mabenê di Samiyan de şe esto) û coka iyê rîpela dimili hewadenê. He çiqas (qandê nêñustin) min xo dîrma jî mi nêşa ey îkna bikirî û peynî de A. Welat dîpela dimili hewadê. Eê se bikin Gerînendeyê rojname yo. Senî biwazo wî keno û winî jî kerd. Ez jî mecbûr menda mi boxçeya xo arêkerd û şiya.

QRALÊ MIN, PIŞTÎ AV
Û ELEKTİRİKË FATÛRAYEKE
SOSRET JÎ JÎ TELEFONA TE
YA BÊRİKË RE HATIYE!.. EM
DANE İCRAYE!.. KUHETA 3
ROJAN EM RANEZİNIN
WÊ DERPIYE QUNA ME JÎ
JI ME BIKIN..




Senî ke min boxçeya xo arêkerd şiya û rojname bêniwîsê dimilî mend, tîrajê rojnamey jî her hefte bi tayn. Tîrajê rojnamî taynmandina jî nêmend, wendozanê dimilî (ebi taybetî embaz Tahsîn û embazanê ci) santralê telefon û adresê e-mail'ê rojnamî kîlt kerdî. Gerînendeyê rojnamey Samî Tanî goş pa nêkîwit, peyd de gam nêcekerd û reaksiyonê dimiliyan nêwast bivîno. Reaksiyonê wendozanê rojnamey zey provakasyonê Zazakistanian hesibnay. Feqet nê taktilê ey nêşa vermiya vilêşayina tîrajê rojnamî bigiro. Peynî de wayirê rojnamî M.Nûrî Karakoyunî ewna o yo zirar keno û o yo nêsho perenê xebatkaran jî bido, dest çekerd mesele û mufetîşê xo rîştî rojname û sebebê vilêşayina tîrajê rojnamî tespît kerd.

Goreyê raporê mufetîşan sebebê vilêşayina tîrajî hewadyayina rîpela dimîlya. Wayirê rojnamî M.Nûrî Karakoyunî jî tespîte mufetîşan ca de diyo û jû meng cezayê rojname ra dûrkerdin, dayo Gerînendeyê Rojnamey Samî Tanî û ci ra vato senî kenê biki wendozanê dimiliyan rîpel yan jî rîpelan aki û fina tevayêdo winayin meki. Nê vatenanê wayirê rojnamî ser, Samî Tanî çewtîna xo qebûl kerd û hem Azadiya Welat de jû rîpel dê min û hem jî Kermêş de ez kerda wayirê quncik. Samî yo hinî jû vatena min didi nêkîno û qîmetê ma dimiliyan zano û cayê quncikanê dêsanê rojnamî de quncikanê rîpelanê rojnamî müsneno min. Feqet nika jî nameyê min vurna û min ra vano "Dimiliyo wayirê torpîl o."

Ev nîvîs ji bo Kêmêşê hatîbû nîvîsîn, lê ji ber ku Kêmêş qedexe bû em di kovara xwe de çap dikin.

KU "EW İCRACI" HATIN Vİ DARI
Dİ QUNA WAN DE RAKIN... KURO
LEKTİRİK GI YE, TELEFON GI YE?
ILA 3000 SAL BI ŞUN DE
VERİN. MA QEY İSOT KETYE.
QUNA WAN QEY YEK HENEKÊN
QUNIKÊ XWE BI ME
DIKE?



SÜJIN

MURAD BATGİ

muratbatgi@hotmail.com

Qiz Qereçî Xatûn Olmaz

Gelo kurdên li Ewropayê wê dikarin bibin Ewropî yan ji Ewropî dikarin bibin kurd?

Ji bo em karibin bêjin wê kurd bikaribin bibine Ewropî, dused û pencî milyon şahid divê. Ji bo em karibin bêjin wê kurd bikaribin bibine Ewropî, dused û pencî milyon caran, dused û pencî milyon ışpat divê. Yanî di encamê de ji niha û heta sed û pencî salen di pêsiya me de wê kurd nikaribin bibine Ewropî. Îcar kurdên ku li Ewropayê dijîn, wê çawa bi Ewropiyan re li hev bikin? Ji bo ku Ewropî û kurd karibin li hev bikin tenê hêviyek dimîne di destê me de, ew ji, ku Ewropî bibine kurd e.

Kurdên me bi salan li Ewropayê dimînin, lê fêrî zimanekî biyanî nabin. Diçin dîsa xwe fêrî zimanê tirkî dikan. Carinan dema tirk dibêjin kurd ji perçeyekî me ne û zimanê kurdî ji şeweyeke zimanê tirkî ye, em dikenin. Lê pişti ku mirov kurdên li Ewropayê dibîne û guh dide tırkıya wan a 'delal û xweşik', mirov hêdî hêdî qîma xwe bi vê iddiaya tirkan tîne.

Demekê du dostê me yên elman, ji bo ku fêrî zimanê tirkî bibin hatibûn Tirkiyeyê. Bi qasî du mehan, ji bo ku fêrî zimanê tirkî bibin, ders dîtin. Ev her du dost birastî ji dostê kurdan in û dixwazin xizmetê bikin. Min ji wan pîrsî, 'Çima ne kurdî, hûn fêrî tirkî dibin?' Ez bi bersiveke geleki balkêş û trajîk ve rû bi rû mam. Dostê me ji min re gotin: 'ji bo em karibin bi kurdan re bidin û bistînin û têkiliyan bi wan re deynin em fêrî tirkî dibin!' Dîsa, berî çend rojan, di encama lêkolînekê de tê diyarkirin ku, di komaleyên kurdan ên li Ewropayê de ji sedî heştê û şes bi zimanê tirkî tê axaftin.

Em ji kurdên me bipirsin, wê bêjin; 'dewletên Ewropî bi darê zorê, me bi zimanê tirkî didine xeberdan. Bimre koledar! Bimre zilma Ewropiyan, bijî duyarlıixa me ya ji bo zimanê me. Tew... tew... tew....


Yanî ez bêjîm qissadan hîsse, ji bo kesek karibe bi me kurdan re têkeve têkiliye divê fêrî tirkî bibe.

Ji bo ku kesek bixwaze alîkariya me bike divê fêrî tirkî bibe.

Bibihîse ey dewleta tirk! Da ku kurd li ku derê dinyayê bijîn ji, dîsa li zimanê te bixwedî derdikevin. Bibihîse ey dewleta tirk! Da ku kurd çiqasî ji te hez dikan. Bibihîse û lotikan biavêye ey Bulent Ecewît! Da ku kurd bi axaftina zimanê te xizmeta polîtikayê te ji dikan.

Divê dewleta tirk xelatan bide kurdên ku li Ewropayê dijîn, da ku zimanê tirkî li navâ Ewropayê ji bi pêş ve dibin, tew ji tirkan bêhtir ji bi kar tînin û bi pêş ve dibin. Ku em li nifşen nû yên tirkêni ku li Ewropayê dijîn binihêrin, emê bibînin ku hîn fêrî zimanê tirkî nebûne. Ma ji kurdên ku dev ji zimanê xwe yên tirkmakî bernadin dor tê kesekî? Kurd ji xwe hey nabin Ewropî, Ewropî ji nabine kurd, lewre, kurd bi kurdî napayevin ku Ewropî fêrî kurdî bibin. Tiştên ku dixuye ew e ku tiştên ku Qanunî Sîltan Silêman nekaribûye bike wê kurd bikin. Wê kurd Ewropiyan ji bikine tirk û zimanê xwe yên tirkmakî fêrî Ewropiyan bikin. Gotinek heye. Dibêjin; 'Qiz qereçî xatûn olmez.' Bavo, kurd dev ji zimanê tirkî bernadin. Ne tenê li Ewropa û Emerîkayê, li ber agirê dojehê ji wê bi tirkî biqîrin û bi tirkî hesab bidin.

Hûnê niha bêjin ev nivîseke çawa ye? Ka qet hêvî di vê nivîsê de dixuye? Ma hêvî di nav kurdan û di pêşvebirina zimanê kurdî de dixuye ku di vê nivîsê de bixuye? Ma em dizanin hêviyê bidine gelê xwe? Ma ez ji ne kurd im?



camerfiraxsho@hotmail.com


Ronî mîna evinê Terî mîna: "Hey Zilito, mîleleti wê sev li te ji bibin sevres"

XWEDE NEHËLE! QAŞO
EZ JI BO BETLANEYA
HAVÎNÊ HATIM GUND.
JI SIBÊ HETA ÈVARE
BI MIN KAR DIKIN



Cem Şeker

ŞEKIRÊ QULQULÎ




Revhat Arslan

G A B Û S



EGER HÜN DİFİKIRİN KU MIHA
BAWDIWLETA MEZİN ZËDE DEST
DAVEJE JİYANÄ WE, HÜN DİWERITIN.
HÜNE GAVÄ KU DEWLETË DEST BI
SÄZKIRINA AVÄHYA GENETİK
YA ZAROKËN WE KIR,
BİBİNIN...



QONANS



G O ~ ~ A



Şev baş ey şev!

Pencereya Peyvê

◆ EHMED HUSEYNİ



Kelehên şevê, yên ji kevirên xilmaşıyê, yên ji awaz û lorînên sergoman, bi raperîn û jena lêvîn te yên beybûnane dorpêc dibûn û min nedixwest stêrkên çavêne ji hêlinâ tirsa min bifirin, min nedixwest serdemêne eşqê bi matmayîna min û te bikenin.

Min çîroka ku di çesnê mirinê de bû, ji pasvanê rewrewkê re hildibijart û min bejna dastana xwe bi sîbera bişirîna te ya reviyayî dialand.

Min gulistanê zuhabûyi yên xewrevînê, evîna sersom a ji kavîlên şewatê, bi ser rakşana porê te de direşandin û min giyana te ya ji xweliyê bi ser serê xwe de dadikir.

Kelehên reş ên bêrîkirina min û te di kuçeyên westana şevistanê de ber bi bêhûdeyî ve wenda dibûn, lê gavê me yên ji raz û efsaneyen ber bi laşê çiyê ve diherikîn û destêne me yên miubreban di destê şoreşa dîn de bê dest û sermest diman.

Min ewrênen bîranînan di esmanê awirvedanê te de didîtin, lê roavahiya derengmayî helkehelk û pîkoliya sînorêne min û te bi bendê xwîn û xatirxwestinê, bi baskêni şkestî yên çarenûsê, nîgar dikir.

Tu bi hilatina bîna şevistanê re dihatî û tu di qebqebea dilê min de hil dibûyi..

Ez ji, ji gerdena şevê, ber bi kula şevê ve dihatim û di nêçîra navê xwe de lal dibûm..

Û hespê min ê birîndar cendekê xalê min ê kuştî ji nav mayinan bi xwe re dianî û tembînameya kulîlkîn bejî di qêrîna min de dadiçikand...

Ez û tu û hespê sosretê, darbesta ji gulwaz û zersonê bîrê û goristana stêrkên ku ji biskêne te bi ser lavlava min de dirijîyan, anîha, li ber pencereya şevê û di qiblenameya şevê de, şevgerîna şûnewaran û şevbuhîrka evînkujan jiber dikin.

De jiber bike ey Goyînê paytextan!

De jiber bike ey ji bermayê bêbextan!

Min lêvîn te ji serihildanê dixwestin, da ku keriyen tozgirtî ji dudiliya pirsê rizgar bikim û stêrka karwanan di axa pîtanokêne te de biçînim. Min destêne te ji reşebayê tirsê dixwestin, da ku rojçebûna aliyên wêranê û li xwemikurhatin û rojmirina helbestê li ser velerzîna wan bikolim û xelwetgehekê bo gunehkariya xwe li ser kenarêne laşê te ava bikim. Min porê te ji desthilatiya nemanê dixwest, da ku pirtûka têkçûnê bixwînim û dapîrên narîn ên ku li ber avê diçûn bibînim û di çemêncegerdar ên hişê te de hînî tobedariyê bibim.

De ey çemênu ku di navbera me û himbêzkirina karxezalan de zuha dibin!

De ey kîlîkîn pêlvedanê yên ku di xuşîna temenê me yê riziyayî de giranbuha dibin!

Şev e ey neviya serberdayî ya binemala şevê!

Bajarê te yê ji çûkan di kirasekî reş de digevize.

Minareyên axînkêşanên te yên ku di sînga min de dengvedidin, reş in.

Berzûrî û hawar hawarên te yên ji mermara çavlîrêmanê, reş in.

Me birîn bi navê Zîna reben aş dikirin, lê goristana dostan û neçariya dayikêni li ber kîlan dihatin bîra me.

Me xewn bi xewnê ve didirût û me gupîtka çiyan bi çîçekên hesret û seferê dixemiland. Me li dîrokê temaşe dikir û em bi hev re digiriyan. Ez û tu, cêwiyyen şevistanâ Skandînavyayê û mîratgirên dibistana erêneyê, evînbazên bê stran û şehîdên bê şînîgirî.

De were rîspiye gumanê, de were eşqa "Selmayê" ji vê hîva xemgîn re bibêje, de were agirê xewna xwe di dilê min de vemirîne, li ser laşê ciwaniyê zikira bêdeng a Botanê dubare bike û kevokêne bendemanê ji riha xwe ya spî ber bi kelehên şevê bifirîne.

De were da em bi hev re ji şevê re bibêjin: Şev baş!

Jî xwendekaran re pêşniyarên fakulteyê Zanîngeha Jiyana Nû!...

Jî bo kesênu ku di azmûna OSS'ye de bi ser neketine: Pisporê vî karî **Evdile Koçer** ji bo we amade kir

Fakulteya Feodalizm û Feminizmê

Mêrê feodal piştî xwendina kîjan pirtûkê dibe serjinik û çawa kinc û firaxan dişo?

Keçen feodal di internetê de bi kîjan "Nickname"î chat dikin û çawa xortan "eyar" dikin?

Li herêma Botan endamê kîjan eşîretê zêdetir feodal in? Feministên welêt hêza xwe çawa bi rê dixin? Serokên feodal li wê dînyayê, bi horiyan bîhuştê re çawa têkiliyan datînin?

Dem: Bersiva van pirsan û pirsên axretê bê lêdan û bê çavderxistin bi alîkariya filozofên welêt tê nîşankirin.

Dem: 3 sal fêrkarî, 4 sal hînkarî

Mamosteyê Feodalizmê: Kakacan Ecevit

Mamosteya Feminizmê: Xaltîka Çiller

Buha: Sê barêne makerê ribêsên Çiyayê Botanê

Fakulteya "Rexne û Lêhûrbûnê"

Rexna ku dibe qansêr bi kîjan bêje û hêmayan û çawa tê sazkin? Beriya keçrevandinê û şeva ewil a zewacê, mirov çawa lê hûr dibe? Dek û dolabên lêhûrbûnê û rê û rîbazên rexnebarandînê ci ye? Ehmedê Xanî dema ku Mem û Zîn nîvîsand, çend rojan lê hûr bû? Evîndar heydu çawa rexne dikin? Di bin destê "İluzyonîstên welêt" û civînên "Babaegîtan" de taktîkên rexneyê û lêhûrbûnê bi awayekî zanistî tê nîşandayîn.

Dem: Çar havîn fêrkarî, şes zivistan şarezakinin

Mamosteyê Rexneyê: Rexnedînê Bêrîx

Mamosteyê Lêhûrbûnê: Hûrzedeyê Tiral

Buha: Deh tenûr nanê klor

Fakulteya Taktik û Stratejiyê

Qonansê Koçeran ji ber kîjan taktikê, qeli û penêr da Malkoçoglu û di ku dê xeletî kir? Gandî bi kîjan stratejiyê ve çû Hindîstanê û çawa mafê xwe ji Îngîlîstanê stand?

Stratejiya hilbijartinan û ya civakguherandinê çawa tê lidarxistin? Xweziya stratejîsazên li Îngîlîstanê, ji ber ci di qirika wan de ma? Li rojhîlata navîn û rojhîlata dûr kurterêyên taktik û stratejiyan bi delalî tê nîşandayîn.

Dem: Heta ku Tirkî têkeve Yekîtiya Ewropayê

Mamosteyê taktikê: Hûthûteyê Bêplan

Mamosteyê stratejiyê: Egîdê Xwenas

Buha: 80 Elbik xurmeyên Bexdayê

Fakulteya Şivanî û Gavaniyê

Mirov ji ber kîjan sedemê, di bin çelekê de li gê digere? Keriyêne pez, çawa ji refen gur û wawîkan tên parastin? Şivan piştî çend sal şagirtiyê, li zozanan "Master"î dikin? Mîhrîcana şivan û gavanê welêt çawa tê sazkin? Ereb Şemo heta ku pirtûka "Şivanê Kurd" nîvîsand çend gur kedî kirin? Ji serayetî heta aqademiya mezîn hemû celebên şivanî û gavaniyê, di gomên germ û li zozanê honik de tên fêrkirin.

Dem: Heta ku berxik bibin kavir, karik bizin bizin

Mamosteyê Şivanîyê: Bazê Gumas

Mamosteyê Gavaniyê: Seyfoye Golikçi

Buha: Heft roj, li çiyê bêxwarin, raketin

Fakulteya Siyaset û Polîtikayê

Li OHAL û BÜHAL'ê siyaset çawa tê meşandin? Şaredarên welêt bi kîjan şewazê polîtikayê dimeşînin? Mirov piştî xwarina çend nanê tenûrê dibe siyasetmedar? Qoriciyên Şimexê ji ber ci dengê xwe didin HADEV'ê? Çend nakokî di navbera kriteren Kopenhagê û frîkîken Enqereyê de hene? Li Amed, Enqere û Waşintonê dersên siyaset û polîtikayê bi zelaî tê hînkin.

Dem: Heta ku OHAL rabe

Mamosteyê Siyasetê: Feqeyê Bêpeseport

Mamosteyê Polîtikayê: Platon Bûhalzade

Buha: Şeş meh li OHAL'ê jiyan

Fakulteya Teorî û Pratikê

Zimanê teorîzedyeyen li Ewropa bi kîjan pirsê tê deşfrekirin? Lenîn, ji ber kîjan pratikê Stalin rexne dike? Di navbera teorî û pratikê de çend gundê şewitî hene. Gelo pratik kuştina teorîstekî ye, an xwendina pirtûkên wî ye? Bi civîn, konferans û semîneran, bi awayekî zindî dersên teorîk û li qadîn Abîde-Hurriyet, Taksim, Konak û Kızılaye provayên pratikî, bê cop û xwîn tê nîşandayîn.

Dem: Beşdarbûna 56 civînan û tevlîbûna 29 çalakiyan

Mamosteyê teoriyê: Quredînê Bêzanist

Mamosteyê Pratikê: Şergoyê Dirûşmezade

Buha: Belas e

Fakulteya Dizî, Derew û Xapandinê

Arsen Lüpen piştî ku li Dêrika Çiyayê Ma Zi zeytûn dizî, çima li wê herêmê dibistanek vekir? Pozê Pînokyâ ji ber kîjan derewê bû 65 milyon metro? Genêni siyasetmedarên li Enqereyê çawa tê dizîn û bi ci awayî tê guhertin? Li Lozanê, dema meclîsa Enqereyê li ser kursiyân derewen politik, li komaleyên

dizan taktikên diziyê û li wezareta karê derve xapandinên stratejik dibe, li gorî "Evrim'a Enstain tê fêrkirin.

Dem: Du heyam perwerdeyî

Mamosteyê diziyê û derewan: Siloyê Şivan

Mamosteyê xapandinê: Smaîl Cem Xopînok

Buha: Çar selik zêren "Erbakan".

Kovara panzderojî (Onbesgûnluk Dergi)

- Xwedî (İmîlyaz Sahibi) **M. Nuri Karakoyun**
- Lijneya Weşanê (Yayin Kurulu):
 - Mazlûm Doğan, Doğan Gîzel, İmam Cicek
 - Berpirsîyare Karê Nîvîsan
 - (Yazi İşleri Müdürü) Abdurrahman Pekedis
 - Navîsan (Yonetim Yeri) İstiklal Cad. Ayhan İşik sokak.19/1 Beyoğlu/İstanbul
 - Tel: (212) 292 72 70
 - Fax: (212) 251 95 85
- E-Mail: pinedank@hotmail.com
- Kargerî (İdare) (212) 251 79 37
- Çapxane: Aspaş Matbaacılık
- Yayın Koordinasyon
- Ada Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd.Şti.
- Belavkirin BİRYAY Dağıtım
- Nûnergeh: Edine: (322) 351 42 78
- İzmir: (232) 446 19 50 Mersin: (324) 237 66 49



ZAROKNO! MÎRZE MIHEMED BI HAWARA WE VE HAT!

DÊ Û BAVÊN ZANA!..

Çirok mamosteyê herî hêja û xwînsêrin e!

Zarokên xwe bi çirokan kurdî razînî!

Tatîl bi çirokan xweş û geş e!

ZAROKEN NO Û NETEBAT!..

Guhê dê û bavêن xwe qul bikin, pirtûka we derket!

Mîrzedînê Mihemed zora Hîmen jî zora Pokemonan jî dibe!

WEŞANÊN WELAT

Jî belavkarên Azadiya Welat û Pîneyê bixwazin.

Tel: (0-212) 251 90 13, 251 79 37 – Fax: (0-212) 251 95 85

Welat derket



Li hemû bayian e.

B E Q

Ên destê sibê hatine dînyê

Hebû tune bû, li welaletê kor û nezanen tenê hûn hebûn. Hûn li serê dil û li ber dilan bûn. Mîza we dermanê 666 gundan bû. Gotinên Konfîçyûs û Platon li ber ên we pişkulên sergo bûn. Pêxemberên

Rojhilata Navîn û paşayen Osmaniyan li ber 'heyran'ên we feqeyen do bûn. Bêhna we ya xwêdânê, mîsa bihuştê bû.

Şirove, 'paşgotin û 'çözümlemeyen' we ji 'Qanuni' re dibûn ferman. Biji hebûna we! (Çavkanî: Mem û Zîn, rûpel 38.)

QUSXANE

Ên berî nîvîro...

Jî şewqa çavên we rexne diabarîn, nîvî gotinên we jî rexnebarandin e. Hebûna we di talûkê de ye. Zimanê we mîna yê kerê dirêj e. Di şevertariyekê de we hanek zuha dabe kîjan evdê Xwedê, di ronahiyê de hûn jî herkesi re dibêjîn. Di ronahiyê de we aveke kîrêt û şelo dabe kîjan mis-ilman û fillehî, (Xwedê xêra we lê nekel...) di sevbûhêrkan de hûn dibêjîn.

MOZ

Ên pişti dana pez

Hevala hêja, pêseroja we baş xuya dike. Pişti ku we zimanê xwe sererast kir, hûnê bibin spiker û di Medya TV'yê pêşkêkirina nûçeyen êriş û binçavkirine de, hûn mad û mirûzê xwe tîrs nakir, û hûnê hînekî jî bibisirin. Dema ku mîvanen bibirin û bibêjîn: 'Biborin, niha Xaltîka Pine li ser xeta silav û niyazên xwe xelas bike, dê saet bibe şarê seveqê. (Alooo, keçê deng têl...)

CASIK

Ên ber êvarê...

Hevalen (ne)hêjal... Pişti lêkolînen li ser hevalen we, me girêka doxîna we, biborin girêka şifra we ya DNA'yê vekir. Li gorî vê yekê: Hûn pirtûkên hevalen xwe didizin, lê disa jî naxwînin. Di civan de xewa we tê û hûn dilê diya xwe jî dihêlin (Qeda li we bikeve). Hûn li keçikên cîranan dinîherin, lê dema ku yek bêhemdi li xwişa we binihêre, hûn nigê wî dişkinin.

ZIRNE


Ên nîvî şevê...

Xwişkê, keko, xalo, metê, pis-mam, dotmam... em nizanîn hûn jî kîjan eşîre ne û navê bavikên we ci ne? Lê em dizanîn ku ev remîl ne li gorî dilê me ye jî. Jî ber cîranekî hûnê bikevin girtîgêhê. Hûnê serborî û derewên xwe yên li dest û zozanan binîvisînin û bikin pirtûk. Pirtûka çar xelatan jî bigirin. Gava hûn jî girtîgêhê derkevin, hûnê bibînin ku eşîra we hilwesiyaye û neyarêne we jî zedîtir bûne.

HUDHUDK

Ên heft mehi hatine...

Evinâra we dê jî we aciz bibe. Dê nameyên we bisewitîne û dû re wê li pê yekî bikeve. Lê qet meraq nekin, wê bi wî re jî ser bike û wê jî hev veqetin. Piş re dê poşman bibe û were cem we. Lê belê hûnê rû nedîn. Dê ew jî dîn û har bibe û derkeve bermameya 'A Takim'. Wê hemû durût û raporêne we yên weke Susurlukê eskere bike.



Rojnameya fulotonom

KUNDIR

Xwesûya Pîneyê

Hejmar: 5 Pişti Isa 2000 > Xwedî û tiştîn din: Faysal Dagli (Li ser navê weşanxaneya T&T) > E-mail: nilamed@go.com

Dolme û diplomasî

Kundir Beroşa Kelandî pêşkêş dike:

Rôportaja sedsalê a Canmircan bi Kek Keya re

Elmania Bernameya mal-bata we Beroşa Kelandî û muxabirê neteweya we Canmircan, bi saya we bi Kek Keya re rôportaja sedsalê pêk anî û meseleya dolme û diplomasiyê safî kir.

-Birêz Keya temâsevanên me ji zû de ye we nedîtine. Beriya xeberdana we kirine. Hûn dikarin ji me re li ser pirsgirêka dolmê, ku bi rûnê zeytûnan tê çekirin, rawestin?


-Belê ezîz'îm, ez bi salan e dibêjim ku meseleya

dolmeyê û meseleya xwarinê muhîm e. Dolme û tew dolmeyên Agopê li Ortakoyê. Ya star! Min di sala 92'yan de, di Kirmizi Koltukê de, ji Ehmed Altan re jî gotibû, dolme divê ji balîcanêñ zirav bêtin çekirin.

-Eceb Kurd çîma nizanîn dolmê ziravbalîcanan çê bikin?

-Niha min di sala 1993'yan de, di rôportaja Aktuelê de, ji sevgîli Vîvet Kanetî re jî gotibû, li gorî dîtina min, em Kurd, heta hînî dolmexwarinê nebin, em bi ser nakevin.

-Temam temam birêz Kek Keya, di diplomasiyê de



dolmê an hêkerûn girîng e?

-Par min ji Cengîz Çandar re jî gotibû, ji ber ku Turgut Ozal, rehma Xwedê lê bê, Kurd bû û pir dolme dixwar, zikê wî diwerimî. Çandar jî got ev tesbîteke balkêş e. Zikêsiya dolmeyê di atêşkesê de belkî roleke girîng list.

-Diplomasî...

-Ezîz'îm, ez çend meh berê li Katalonyayê bûm, min ji parlementerê wan re jî got; di sala 1994'an de,

dema ku ez di ciyâna xwediyyen rojnameyan de diax-ifim û Clinton di salonê de li min guhdarî dikir, min hînê sê teyfik dolme xwaribû. Paşê min bihîst ku Clinton gotiye; ev Kurd ci xweş xeber didin. Yanî helbet li gorî dîtina min, di diplomasiyê de, ji bo xeberdanen xweş, dolmeyen xweş lazim in. Pirsgirêka hêkerûn jî, li gorî dîtina min zêdetir li nav welatên lipashmayî girîng e.

-Sayin Kek Keya pişti Beroşa Kelandî hûnê ci bikin?

-Ez û sevgîli Sefirat, emê herin dolmeyan bixwin...

-Ez jî werim sayin Keya?

NÜÇIK



Şaredarên HADEP'î bi hev re dest bi dibis-tana muzîkê kirin. **Kundirpress** derxist holê:

Ji ber ku sirûda 'qorkma sonmez' xerab xwendîne, waliyên heremê şaredarên kurd giî kirine. Li ser vê yekê jî şaredar ji bo waî fedîkar derxînîn bîryar girtine ku hemû bi hev re dersên şan û notayê bigirin û 'qorkma sonmez' ji waliyan xweştir bixwînin. Hat diyarkirin ku serokê HADEP'ê bi Orkestraya Filarmonî ya Berlînê re peymanek çê kiriye ku şaredarên wan di nava 15 rojan de fêrî marşâ tîrkan bikin. Şaredaran ji Kundirpress re wisa gotin; bi vî awayî wê işekî din jî bi destê me keve, hîc nebe emê li îlerde karîbin bibin dengbêj û debara xwe bikin.

Heyêtên YNK û PDK'ê ku li Washingtonê ne, ji bo 50 dollaran bi hev ketin. Li gorî sîxurên **Kundirpress**, herdu heyet, dema ku bi hev re ketine avahiya Qesra Spî, li erdê 50 dollar dîtine. Bi dîtina pereyan, heyetan xwe avêtine ser. Herdu aliyan jî idia kirine ku cara pêşin wan pere dîtine. Pişti ku bâyer mezin bûye Clinton ketiye nav wan, lê nekarîbûye wan aş bike. Li ser vê yekê piyadeyên deryayı yên Emerîkî 50 dollarên lierdîdîl dane Ehmed Çelebiyê serokê INC. Ú Kurdan jî paşıya stuyê xwe xurandine.

Cahid Merwan û Elî Manaz li hev xistin.

Rojnameyan Elî Manaz ji Cahid Merwan pîrsiye: Tu kî yî?

Merwan li ser vê pîrsê pêşiyê şas, paşiyê jî fas bûye û êrîşî Elî kiriye. Pişti ku di nav aliyan de 'barış süreci' çê bûye pîşperdeya meseleyê hatiye fêmkirin: Rojnameyan Elî Manaz bi navê 'Kî kî ye?' ansiklopedîyek amade dike û xwestîye navdarekî Kurdan yanî Cahid Merwan jî têxe ansiklopediya xwe û ji bo vê yekê jî ji Merwan ev pîrsiye. Merwan jî gotiye ez Cahid Merwan bim û tu min nasnekî ha? Ú êrîşî Elî kiriye.

BELEDIYA AMEDÊ TIRKÎ HÎN DIKE!..

Di kûrsên ku di sala 95'an de ji alyê Yekîtiya Ewrûpayê ve hatiye finansekirin niha bi destê Belediya Amedê tirkî tê hînkirin.

